## Pîvanên navneteweyî ji bo zarokan di dema şerê çekdarî de

Pilana kar ya Neteweyên Yekbûyî li gorî biryarên Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî, Zagona Şerê Çekdarî û Zagona Mafên Mirovan ji bo zarokan, ku ew zagonên navneteweyî ne parastineke taybet ji di demên şerê çekdarî de didin zarokan:

- Divê ji zarokan re alîkarî û lênihêrîna pêwîst were peyda kirin, wek Pêdîviyên bingehîn (xwarin, av, kanalîzasyon, hwd.), Lênihêrîna tenduristî, parastin ji tundûtûjiyê, tevlebuna malbatê xwe heke ew ji hev û du cuda bin, perwerdehî û xweşî
- Tevlîkirin û bikaranîna zarokan di şer de ji hêla aliyên şerê çekdarî ve qedexe ye. Riza zarokan ne têkildar e



### *Tekoşîna ji bo Mirovahiyê*

**Tekoşîna ji bo Mirovahiyê** (FFH) Rêxistinek Swîsrî ye destek dide Pilana Kar ya di Navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û Neteweyên Yekbûyî de hatîye îmze kirin dike. Rêxistinê ji bo fermandaran, yekîneyên taybet, hêzên ewlekariya navxweyî û Rêveberiya Xweser li ser naveroka Pilana.

Kar ya Neteweyên Yekbûyî bi Hêzên Sûriya Demokratîk re perwerde û civînan lidardixe û bi Hêzên Sûriya Demokratîk re ji bo derxistina nave Yekîneyên Parastina Gel YPG/YPJ ji nav lîsteya Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî ya taybet bi tevlîkirin û bîkaranîna zarokan di nav şerê çekdarî de.

**Tekoşîna ji bo Mirovahiyê** – Geneva – Switzerland – fightforhumanity.org

design: www.kathleenmorf.ch

قوات سوريا الديمقراطية
Hêzên Sûriya Demokratîk

# Parastina zarokan ji bêtarên şer

## Pilana Kar ya di navbera **Netewên Yekbuyî** (UN) û Hêzên Sûriya Demokratîk de



# Pilana Kar ya di navbera Netewên Yekbuyî (UN) û Hêzên Sûriya Demokratîk de

Hêzên Surîya Demokratîk (QSD) yekmîn hêza leşkerî di Sûriyê de ku di Puşbera 2019 an de bi Netewên Nekbuyî re Pilaneke Kar ya ji bo parastina Zarokan ji bandora şer îmzekir.



## Bandora pevçûnên çekdarî li ser zarokan

Pevçûnên çekdarî li ser zarokên di bin temenê 18 saliyê de bi taybetî xeternak in. Ew paşeroja civakin û pevçûnen çekdarî dikarin bandorek neyênî li ser birêveçuna jiyana wan bike ji ber ku ew ji malbatên xwe tên veqetandin, ew derfeta perwerdehiyê winda dikin, û dibînin ku pêşketina jiyanî û laşî ya wan bandorek neyênî dibîne. Şer ne cihek e ji bo zarokan.

## Aliyên Pilana Kar îmzekirine

Hêzên Sûriya Demokratîk.

## Aliyên din yên Pilana Kar destek û piştgirî dikin

Rêveberiya xweser ya Bakûr Rojhilatê Sûriyê.




**Piştî îmze kirina vê Pilana Kar, Fermandarê Giştî yê Hêzên Suriya Demokratîk di Tebaxa 2019an de fermankeke leşgerî ji bo agahdar-kirina tevahî pêkhatî û girûpên leşkerî yên Hêzên Sûrîya Demokratîk derxîst (ragîhand) û ev ferman dan:**

**1.** Qedexekirina tevlîkirin û bikaranîna keç û xortên temenên wan bin 18 salî re di nav Hêzên Sûriyeya Demokratîk de, ev ji bo rola şervanan an her rola piştgiriyê ya din, wek rakirina bar, xwarin çêkirin an birêvebirina bendên kontrolê, pêk tê.

**2.** Naskirina her zarokekî ku temenê wî di bin 18 salî de di nav refên tevahî Pêhateyên Hêzên Sûriya Demokratîk de, ev yek jî li gorî şopandîna dîroka ji dayik bûnê.

**3.** Hesanî kirina radestkirina bilez û vegera zarokan ya ji bo jiyana sîvîl bi riya radest kirina wan ji saziyên têkildar re wek Desteya Perwerdê ya Rêveberiya Xweser ya Bakûr Rojhilatê Sûriyê.

**4.** Qedexekirina jinûve tevlîkirina keç û xortan ji hêla hêzên ku di nav Pilana Kar de ne.

**5.** Avakirina bîruyên lêkolînê di bin fermandariya her herêmeke leşkerî de ji bo wergirtina gilî û raporan ji malbat, dayik û bav û xewdiyên zarokên temenê wan di bin 18 salî de ku di nava Hêzên Sûriyeya Demokratîk de ne, karê van bîruyan dê bersivdayîna gilî û raporan be piştî lêpirsîn û şopandînê.

**6.** Belavkirina naveroka Pilana Kar li tevahiya bîru û ekademiyên leşkerî yên têkildar di nav Hêzên Sûrîya Demokratîk de.

**7.** Bi cihkirina prosîdorên cezakirinê li dijî her kesekî ku li gorî fermana tevnegre, Rêveberiya Polîsên Dispilîna leşkerî wê efser û fermandarên eeşkerî yên fermanan bin pêbikin dadgeh bike.

## Di çarçova Pilana Kar de, Hêzên Sûriya Demokratîk pabendî van xalan dibin:

- Bilindkirina asta hişmendiyê di nav gelên û civakên Bakûr Rojhilatê Sûriyê de
- Piştrast bin ku ti kiryarek neyînî li hember qurban, şahid, şopîner an hevkarên Netewên Yekbuyî neyê kirin
- Hesankirina çavdêriya Neteweyên Yekbûyî. Neteweyên Yekbûyî pêgir e ku çavdêrîya pabendbuna HSDê bike û piştrast bike ku çalekiyên ku li gorî Pilana Kar hatine pilankirin tên pêkanîn. Ji hêla xwe ve Hêzên Sûriya Demokratîk kordînetorekî leşkerî di asta bilind e erkdarkiriye , ev kordînetor jî ji aliyê kordînetorkî peywendiyan yê sîvîl ku ji hêla Rêveberiya Xweser hatiye erkdar kirin dê were destek kirin û bi Nete-weyên yekbûyî re peywendî were kirin.